Ez deyndarê Şivan Perwer im.

Mihemed Elî

efrin2612@hotmail.com

Şivan Perwer, dema ku ev nav tê ser zimanê mirovekî, ne tenê kesên derdora wî, lê heya dar, ber, çem, giya û ezmanê Kurdistanê jî di cihê xwe de vediciniqe! Şivan perwer ew kes e, ku bi kenê kurdan re kenî , bi xeyda wan re xeyidî û bi rondikên wan re rondik barandin. Şivan Perwer di şikestên Kurdan ên herî xedar de bû qeyaq û palpişt, ew di şahiyên kurdan de bi serkêşekî govendê û dilên çiqas kurd û dostên wan hene di ber deng û awazên xwe re hilperandin.

Dema mirov behsa şoreşvanên kurd dike, Şivan di rêza wan de ye, dema mirov behsa kedkaran û fedekaran dike, Şivan di nav de ye û dema mirov behsa çiyayên Kurdistanê dike, ku her û her serbilind û xwedî rûmeteke herman in, Şivan perwer dîsa di nav de ye…

Şivan barana hemû tovên kurdayetiya, ku di dilê her kurdekî de dipişkuve ye, Şivan wek ava Firat û Dîcleyê zeviyên hêz û heyîna me av dide, Şivan wek sitêrka Gelawêjê her û her bangîn e. Roj radize, şivan şiyar e, çem diçikin Şivan diherike, şoreş dikevin şivan jê re dibe ardûyekî nû, fîşek diqedin şivan dibe qurşîna tivingên xwe berdidin sîngê dijmin. Erzaîl êdî ji dengê şivan di ta û sawê de ye, dijminê gelê Kurd jî, pêdivî nîn e em bêjin çendî sira Şivan ew xisitiye nav fikaran û mitalan…

Şivan bi nefsbiçûkî xwe kir şivanê doza gelê xwe û di hemû xweşiyên jiyanê borî. Ew seba xatirê çavên Kurdistanê bû têkoşerekî serhişk û hew amade ye xwe radestî vîna bedbîniyê bike (Her çiqas henek be jî, dibêjin Sedam Husên rojekê gotiye: Gelo ev çi Şivan e, sed nivîskarên Ereb nikarin şivanekî şiyar bikin, ema Şivanekî Kurdan heye, ku bi dengê xwe bi milyonan Kurd şiyar kirine).

Xelîl Hayalî dibêje, ne pêwîst e, metelok û gotina pêşiyên kurd çiqas argo bin, ya girîng ew e ku ev berhem hilberîna Kurdan in. Ji lewre ez jî dixwazim vê gotina pêşiyên kurdan sebaret bi mijara me bînim ziman: Dibêjin mirovekê navê wî tune bû, rabû li nîvê rê rît bo navekî ji xwe re derxîne! Ji xwe birêz Şivan jî amaje bi vê yekê di hevpeyvîna xwe bi rojnameya Rûdawê re kiribû, lê wek li cem wî edet e birêz Şivan her û her tiştan bi rengekî hunerî dibêje û wek min, haşayî wî, ne ters e!

Ez bixwe mirovekî pragmatîk im, ango tiştên ku di ketwarî de bandora xwe dikin li ba min xwedî nirx in. Lê kesên ku ji bilî bêbextî û gotinên vala di paxila wan de nîn e, jixwe ew in kurmên dara me! Min bi xwe tîşkên kurdayetiyê, ku dijmin bi şev û roj hewl dida ji ber çav û dilê me berbend bike di deng û awazên Şivan perwer de dîtin.

Hemû derdora ku ez bi xwe nas dikim, li rawesteka Şivan li tirêna kurdayetiyê siwar bûne…

Îca ka em îro bimeziyînin kesên ku qilçiq di çavên xelkê de dibînin, lê derziyê di çavên xwe de nabînin, çi kirine. Hinek dibêjin: min giliyê Şivan perwer li cem hukûmeta Kurdistanê kiriye, hinekan jî, baş tê bîra min, di sala 2004'an de, dema ku serhildana başûr-rojava gihîştibû lûtkeyê û hemû wêne û vîdeoyên serhildanê jê re dihatin veguhestin, xwestin wan video û wêneyan bi diravan bifroşin Televizyona Îsraelî! Ev derfeta zêrîn ku rengê hovîtiya Bees di televizyona Îsrael de were raberkirin bû qurbanê çend hezar Euro. Îro jî heman kes dema ku malpera wan beravêt, li kar û xebatên xwe yên taybet geriyan, li ser şopa hevalên xwe, di vê şanoya kelevajî de, meşiyan û berê xwe dan Kurdistana başûr bo parsê ji hukûmeta başûr bikin, dixwazin bi vê bizava, ku birêz Şivan bixwe gotiye: *Ew kesin ku tiştan mezin dikin û dixwazin di rêya min de navdariyê ji xwe re peyda bikin. Herwiha dixwazin min bixin nava helwestekê de ku ew bibin xwediyên doza Pêşmerge. Herçend ku ew di qadeke berevajî de li hemberî min û Pêşmerge dimînin*…

Ev kes malpera wan zêdeyî şeş heyvan bûye, rojekê nehatiye rojanekirin, piştî ji parsa xwe vegerîn, êdî dîtin deng nemaye! Vêca ew ê çi bikin, ew ê helbet wek pêşiyan gotiye li nîvê rê birîn.

Birayên min, êdî bes e, xelk her û her qedir û hurmetê ji mezin û rêberên dengê neteweya xwe re digirin. Ka bimeyzînin, sedî nod ji Tirkan dizanin Ataturk ne xwedî hemû ged û şanên, ku ew wî bê dixemilînin e, lê ji bo xatirê welatê xwe dîsa van tiştan dadiqurtînin. Ez Şivan perwer bi Ataturk re naxim heman diyarokê, haşayî Şivan perwer, wî her û her bi bîhna gulan û bi dengê aşîtiyê bangî mirovantiyê kiriye, ema ataurk kesekî kujer û xwînvexwar e.

Heke hûn rast dixwaznin xizmetekî ji kurdan re bikin, bibin xwedî rêbaz û li ser çemkên sincî bimeşinin. Bawer bikin, hûn dê wisa bi asanî ji xwe re cihekî di dilê kurd û Kurdistanê de ava bikin. Mezinahî bi qeşmertî û karê mûzmihel, şamûr û bêbextan çênabe. Dev ji karê qeşmeran berdin!

Piştî dayîka xwe ez ji bo tova kurdayetiya xwe wamdar û deyndarê Şivan Perwer im.

30.05.2010

Bern